
# NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

<u>Xebat ji bo :</u> * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*

*Email :* Newroz95@hotmail.com

| Hejmar (82) | Ç.Pêşîn | 2008 z-2620 k | Buha (15 ) ps |
|---|---|---|---|


# Sûriyê û astengiyên jiyana rojane

**E**m dûr neçin , gava tu bala xwe didî rewş û jiyana xelkê Sûriyê bi tevahî , kefteleft , cefakêşî û nexweşiyên di nav civakê de , tu dibînî û dibhîsî ku çendî mirov mijûl û westa ye , bi xem û qiswet , bi derd û êş e ,..Bi tirs e!.

Li hêlekê , bihabûneke serberdayî ku stoyê piraniya xelkê badide û dihêle ku , mirov bona nanzikê bêtirî 12 se'etan bixebite û hêjî têrê neke . Û ji bilî pirsa nanzikê , pirsa biserîkirina xwendina zariyan û nemaze şûnketina pileya guhdanê di dibisatn û zanîngehên fermî de .

Li hêlekê , fatûrên avê , kehrebê û telîfonê û xwedê nekê lêçûna serdana doktûr û ezexanan . Û li hêleka dîtir , bêkarî bi xwe , evê ku roj ji rojê bêtir dibe û gelek nexweşiyên bi tirs bi xwe re, ji dizî û malxuriyê de bigir , ta tu bighê pevçûn û kuştinê tîne holê …vêca çûnhatina ber deriyên hekîm û hikûmetan , girtîgeh , parêzer û dadgehan . Û xwedê zanê (ew) lê digerin , polis û karbidestên dewletê , ên ku çavan digerînin û dev ji hev vekirine ku , çawa xelkê bidoşin , beriyan tije bikin , teşqelan û nerindiyan bihevxin , da ku xwe li ber vê yekê deynin , ji ber ku , ne berketiyê min û te ne , ne berketiyê miletê xwe ne , ..ne xema wan e , bila cixara wan pêketî be , û agir bi bêdera gund ketibe , ji ber ku ew bes ji xwe re ne û hew .

Li vê dawiyê , ji neçarî , ji dest bêkarî û xizaniyê , bi hezaran ji xelkê me yên Dêrîk û Dirbasiyê û wekî dî , dev ji gundên xwe berdane û berê xwe dane derdora Şamê , bihêviya ku – xwedêgiravî – karekî ji xwe re peyda bikin û herweha bi dehhezaran ji xelkê ereb ji herêmên Dêrazor û Reqê , ku rewşa wan ne kêmî wan kurdan e ger ne kambaxtir be . Bi ser de jî , herêmên parêzgeha Helebê, çi ji herêma Kobanî, Kurdax û wekî dî , bi hezaran xelk , nemaze xortên nûhatî û kirêkar, hurve wirve diçin û tên , bi hêviya ku karekî bi dest xwe ve bînin , anjî , riyekê ji riyan peyda bikin û xwe bighênin Qibris an Yonanê ...Hwd Tevdîr û fermanên

**D.R.(11)**

www.arsivakurdi.org

**NÇE NÇE NÇE**

**Bajarokê Şiyê Perda reş girêda**

Roja yekê ji cejna rojiyê -01-10-




ŞîxoEloş



Ebdil-ezîz

2008- li bajarokê Şiyê, qederê perda reş bi ser de berda. Di encama bûyerek tirafêkê de, sê ciwan 1-**Şêxo Eloş kurê Mihemed** ji gundî Şiyê 2- **Ebdil-ezîz Yosif kurî mihemed** ji gundê Şiyê 3- **Ehmed Eloş kurî Ebdîn** ji gundî Erendê çûn ser dijovaniya Xweda.



Ehmed

Di wê rojê de, kat Ebdil-ezîz bi beşdariya xwedî û berketiyn wî li gorisatana bajarokê Şiyê tê binaxkirin. Roja din kat 9.30 heval Şêxo Eloş bi beşdariya xwedî, gundî, havalên partia Yekîtî ya Demokart a Kurd –YKÎTÎ- , li guristana gund tê veşartin.. Heval bavê Rêber gotineke gurt li ser xebata havalê xwe got û di dûre, bavê bahoz jî hin şîretan li bav û ciwanan dike. Piştr e, beşdar berê xwe didin goristana gundê ERENDÊ û Ehmed jî binax dikin

Bila serê xwedî û gundiyên Şiyê û Erendê sax be û ciyê wan buhişt be.

## Heval Weqfî jî barkir

Di 20 ê Ç.Pêşîn de, li nexwaşxana Ibin El-rişd li Heleb, piştî demek dirêj ji nexwaşiyê, Hevalê hîja mamoste Weqfî, çavên xwe damrandin. Bi beşdariya xwedî, heval û dostên wî, kewranekî mezin bi termê wî re bi rêket û berê xwe dane gundê Kêla. Li gundê Kêla, bilî kewranê Heleb, gundiyên Kêla û derdora wê jî li ser gurnê beşdar bûn. Piştî Telqina mele, bi navê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê –Yekîtî- endamê komîta siyasî evokat Reşîd Şe,ban , ev gotina jêrîn xwend:

**Birayên hêja ....**

**Mîvanên giranbuha....**

Ev roj, rojeke xemgîne, roja barkirina hevalê me, mamoste Weqfî ya ser dilovaniya xwe ye. Heval Weqfî, di destpêka jiyana xwe de, xemxwer û berketiyê miletê xwe bû. Di zanîngeha Heleb de, ji bo doza gelê xwe, çalakvan, jîr û jêhatî bû. Û di dibistanan de, tu cudahî , di navbera şagirtên Kurd û Ereb de nedikir.



Beşdarên hêja .... Mirina mamoste Weqfî, ne tenê zirara malbat û gundê Kêla bû. Lê belê, zirara miletê Kurd, tegera wî û demokrasiyê bû.

Bi navê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê –Yekîtî- bila serê malbat, xanim, herdu zarowan, Gundiyên Kêla û derdora wan , heval û dostên wî saxbin. Û sipas ji guhdariya we re.

www.arsivakurd.org

**Bi boneya lidarxitina mehrecana helbesta Kurdî**, kovara Pirs û weşana Newroz , ev namên jêrîn bi rêkiribûn:

### Nama Pirsê

**Silav û Rêz..**

Eger wêje gulîstan e, helbestvan perwane ye, ji her gulekê bîn û rengan dibe, tovên wan tevlehev dike û gul û reng û bînên herî ciwan û nazik bi pêlên hestên xwe dafrîne û bi ezmanê mirovatiyê de berdide.

Em bawer dikin ku her helbestvaekî Kurd Perwanke evîndar e, gul û rengên herî dela di gulîstana wêje û bêjeya Kurdî de dafirîne û hêviyên jiyaneke azad bilintir dike.

Em bi navê kovara "Pirs", komîta amadekar a Mehrecana Helbesta Kurdî û helbestvan û hemî beşdarên dilsoz silav dikin û paşerojeke serkeftî ji peyva ciwan û ji zimanê Kurdî yê şêrîn re hêvî dikin…

**Kovara Pirs 22.10.2008**

### Nama Newrozê

**Biraderên hêja …**


Helbest beşeke fereh û pir giring e ji wêje, ew kane bibe nînika ziman, raman, civak, şaristanî, dîrok, sirûşt û her tiştên din… kane bawerî û hêviyên kes, civak û miletan jî bi şêweyên herî zelal diyar bike.

Bêje hespên rewan in, helbestvan jî siwarên di meydana demê de ne, ne bêje ditebitin û ne dem radiweste û herwiha divê helbestvanê bêjeya Kurdî jî herdem di wê meydanê de be û ji pêşbirka helbestvaniyê ya diwar qet venekşê.

Birastî em gelek xemgîn bûn wekî ku bûye çend sal Mehrecana Helbesta Kurdî li Sûryê li dar nakeve, ji ber wê jî em vejandina Mehrecanê gaveke pir hêja û pîroz dibînin. Em bi navê weşana "Newrozê" komîteya amdadekar pir spas dikin û ji dilûcan de serkeftinê jêre dixwazin.

## Ebdile Mele Silêman
## Koça xwe ya dawîn bar kir

Roja Şemiyê 27.09.2008 Z, xelkên bajarê Qamişlo, bi dilekî kul û şikestî, cendekê welatparêzê kurd **Ebdile Mele Silêman** di goristana **Qidûr Begê** de veşartin.



Buhuştî Ebdile, sala 1937an di malbateke weltperwer de jidayik bûye, bi armanca pêkanîna jiyaneke azad û bi rûmet ji gelê kurd re, wî gelek sal ji temen û cuwaniya xwe di kar û xebata rêxistinî de derbas kirine. Di sala 1966an de, ew tevî birek xortên kurdan digel bavê xwe Mele Silêman û birayê xwe **Salihê Mele Silêman** di ber doza gelê xwe de têne zindankirin û wan di zindanê de berxwedaneke berbiçav nîşan dane.

Cihê wî buhuşta rengîn be, serê malbat, meriv û hogirên wî sax bin

www.arsivakurdi.org

# Xewnên Ciwan

**Enehîte Morad**

Her mirovek di destpêka temenê xwe de, pir pêjin û xeyalên geş û bilind ku , ewê di pêşe rojê de duhatiyeke xweş û rind dûrî xem û qisawetan yê bibîne. Hêvî jî , weke keçike kurd xwedî pêjin û xeyalên cur bi cur bû , her roj ji berî çona zanîngehê li pêş eyinkê disekinî û bi dengekî bilind bi xwe re dipeyivî û weha digot : Bi xwedê ez ji keçên xweşik û bedewim , jîrek û hişmendim bêgûman dema zanîngeha xwe kuta bikim hîngê bi dehan ew xortên hêja û ciwan yên li deriyê mala bavê min vepekin û min bixwezin. Vêca jî, ezê xotekî li gor dilxwezî û hêviyên xwe bipejirînim, Piştî demekê Hêvî zanîngeha xwe kuta dike û li benda xortekî hêja dimîne , lê mixabin sal û demsal diborîn ! Ew xotên li gor dilxweziya Hêvî li deryê malê ne dixistin rojekê weke her caran Hêvî li pêş eynikê bi dlşewat disekinî û li xwe temaşe dikir didît ku çend hevidên porê sipî di serê wê de xûya dikirin, hîngê di berxwe de dipeyivî û weha digot : Wey xalî li serê min be, va ye temenê min bûye sî û pênc sal in û porê min sipî bûye hê jî li benda xortekî hêja û dilsozim ! Ma gelo ji bo çi û sedem çiye ku , xortên me keçike mîna min napejirînin di wa destnavê de girî lê diselitî û wê bi dengekî bilind û şewat dagirî ?. Diya wê bi lez û bang dibezî, hêviya min çi heye te xêre digirî ?. Hêvî bi kesereke kûr ji diya xwe re digot : Yadê vaye temenê min bûye sî û pênc salin û hê jî , li benda xortekî dimînim, ev çi dadimendi ye ma gelo dema ez xortek bama hîngê bi serbestî minê li gor dilxweziya xwe keçikek bidîta ! Lê ji ber ku ez keçikim çênabe û ji mafê mine ! Bi girî li diya xwe dimeyizand û gotinên xwe berdewam dikirin û digot : Ta kengê emê kolê gerdîşên civakî yên pûç û vala bimînin nezanî di civaka me de serî hilde, gelo ne gunehe ku keçike mina min bi kalekî şêst an bêtirî şêt salî re bizewice, bi vê awî hest û nestê jinê bin pê dikin, vêca jî bi bîr û baweriya civaka me ku, pêwîste keçik di temenkî biçûk de bizewice, bi vê awî pirsgirêka jinê çare ser dikin. Lê mixabin birek ji jina bi hêsanî encama vê rûdawê têne xopandin û dikevn deryê şaştiyan loma jî salê bi dehan têne kuştin û hê jî çi li vir û çi li wir ji hêla hin kesan ve gotinên pûç li guhên me dixin û dibêjin : Jin çi dixweze wê hemû mafên xwe sitandine, jin di hevdema me de rêzgar û serbixwe ye ! Bê gûman ev henek û sixêfên ew kesên nezan û rûreş in ? yadê divê ya rasit bêye gotin ku jina kurd îro li êş û janên xwe di pêjin û xeyalên xwe de mîna min pal vedaye, Loma nîvê civaka me îro ker û lale ! Diya Hêvî bi rûkî berkenî bersiva keça xwe weha dida û dikot : Belê keça min gotinên te rastin , mîna te pê nizanim tiştê dizanim ku , dema welatê mirov ne serbixwe û azad be hêmenî di tu waran de nîne , ji ber ku , pir tişt ne di destên me dane ,hêvî û armanca me ku, keç û xortên me bixûnin û pileyên bilind bistînin ta ku , karibin li rex hevdû di her warekî de rola xwe bilîzin, nezanî û nexaşiyên civakî kêm û qelis bikin: Heyif û mixabin ku , nifişên mîna te riya rast nasnekirine bi tiştine pûç û vala diponjin û temenê xwe di pêjin û xewinan de diborînin, Hîngê hêvî bi şêtmayî li dayka xwe temaş dikir û digot : belê yadê ez bi dayîkên mina te pir şanaz û serbilindim îro ramanên pîroz di serê min de vejandin ? ev sîstema bavê berdewam e û welatê me bindest û dapeşkiriye bêgûman civaka me serûber yê di nava nezanî û şûmabûnê de li ber xwe bide wisan jî girînge ku , em xwe bidne hev û li li ser riya pêkianîna demiqurasî û mafên mirovan xebata xwe bajon serî.

.

www.arsivakurd.org

# Bîstsalaiya goçkirina birêz Nûredîn-Zaza

Hesenê Cûmi

Bi birbanga şevek ji şevên zivistana – Sibat- 1919 na re, li bajarokê Madanê, li Kurdistana Bakur, qêrîn bi N. Zaza dikeve û çavên xwe vedike.N. Zaza kurêYûsif EFendî kurê Ibrahîm Mistefa ye. Bapîrê wî Ibrahîm, parêzgehê bajarokê Madanê bû, malake welatparêz û mala wan li ber mîvanan hertim vekirî bû.

Piştî rûxandina serhildana bavê kal Şêx S,îdê Pîranî, bav, herdu bira û pismamê wî, Osman efendî ji hêla destlata kemalîzmê ve têne girtin. Di zîndanê de, pismamê wê, ji ber helwestên xwe ve tê guştin û bav û herdu bira, piştî deh heyvan têne azadkirin. Di 28 ê Ç. Pêşîn de, diya xwe diçe ser dilovaniya xwedê, ev bûyer birîneke kûr di dilê wî de çêdike. Piştî hilewşandina şoreşa Agirî ya bi seroktiya Ihsan paşa, ew û birayê wî Dr. Nafiz, malbata Arif Ebas û Zulfî ji neçarî derbasî bin xetê dibin û li bajarê Heleb bi cî û war dibin. Di Êlûna 1930î de, ew û birayê xwe berê xwe didin Şamê û taxa Kurdan bi cî û war dibin. Di sala 1944 an de, berê xwe dide Kurdistana Başûr, lê mixabin, li gel hevalên xwe têne girtin û 12 heyvan li zîndanên Mûsil û Bexdadê dimînin. Piştî zîndanê berî xwe dide Libnanê û xwendina xwe didomîne.Piştî Lîsansa rêzanî distîne, berê xwe dide Siwîsra. Di heyva çilê 1949 an de, bi birêz Ismet Şerîf Wanlî re û xwendekarên Kurd li Siwêsra, komela xwendekarên Kurd li Ewropa dadmezrînin. Di dawiya hizêrana1956 an de, piştî diktora kuta dike. Li Sûriyê vedigere.? Li ser vegera xwe weha dibîje:

**Dema ez ji gemiyî peyabûm, min dizanî ku, gelê Kurd li Sûriyî pir hêvî û daxwazan ji min dike.Gelo: Ezê karibim wan hêviyan bi cî bînim ?!.**

Piştî damezrandina yekemîn Partiya demokrat a Kurd li Sûriyê, di 14ê hizêrana 1957 an de, berêz Dr. N. Zaza derbasî nav refê partî dibe û yekem serokê partî bi nav dibe. Di sala 1960 î de, destlata Sûriyê, bi hovîtî dest davêje endamên partî, piraniya endamên komîta navendî û di nav wan de, Dr.N. Zaza jî tê girtin. Li Pêş dadgehê, Dr. N.Zaza , bi hişmendî di ber mafên gelê xwe û hebûna wî ya dîrokî de bervedanê dike : **Ez ne cudaxwazim ez mafê gelê Kurd dixwaz im**. Piştî salekê azad dibe. Piştî wergêra partiya Be,s ya di 8 ê avdara 1963, Dr.N. Zaza dikeve bin biveke mezin. Lewre, berê xwe dide Libnanê. L wir jî , ji ber karê xwe yê kurdayetî bi cî nabe, destlata Libnanê wî derbasî Jordinê dikin û destlata Jordinê jî ,wî ji nû ve vedigerînin Libnanê ew jî, ji hêla xwe ve, di15 sibata 1966 an de, didine destlata Sûriyê û 7 heyvan di zîndana Şêx Hesen de diborêne. Di şerê Ereb û Isra,îl yê di 5ê hizêrana 1967 de, keys dikeve Dr.N.Zaza û direve Kurdistana Bakur û di sala 1970 î de neçar dibe û penaberî Siwêsra û li wir bi rojnemevana Siwêsrî Gilbete Fare re dizewice û tek kurek Şengo jêre tîne. Û li zanîgeha Loznê mamostetiya zimanê Firansî, çand û dîroka kevin dike.

Bê guman , birêz N.Zaza pir hişmend û zana bû.

www.arsivakurdi.org

# Te got û min got nebû tu cot

Memê Alan

Di bîjin bi gotgota tu kar bi serî nabin , bi gulekê buhar çênabin , bi destekî çepik lênadin û nejî bi mirovekî dêlan digerin

Yanê bi rêvebirin û bi serîkirina her karekî li paş gotabêjê , kirdekirin gereke

Hîn divê cîhana tijî guherînên zor lezok de , kirdekirina tevane û giştî jî ne bese

Çi kar be , ta ku , bi dawî were û mirov tê de bi serkeve , pêşve here û bi guherînan re bimeşe , hin merc û erk divên .

**1**-Gotbêj û şirovekirina li ser wî karî û zelalkirina wê gereke , ta ku ev encama diyar dibin :

- Armanc ji wî karî , yanê mirov çi ji wê karî dixwaze .
- Beramberkirina kar û zirarê wî karî
- Danîna bernamakê ji bo serxistina wî karî .
- Binavkirina kes an komîteyên wê kar û lebatê .

**2**-Hejmarên endamên wê li gor mezinbûna wê karî bin .

**3**-Pisporkirina wê karî û belavkirina beşên wê li ser endaman , ta ku , durvekî dezgehî û li saz destîne .

Çimkî mirovek bi tena xwe nikare karekî ji xwe mezintir yan jî ne karê xwe bi serxîne .

Ji xwe berê herweha mirovek nikare pir karan jî bi hev re bike , ger kir jî yan nikkare wek tê xwestin bi serkeve , yan jî wê di nîvê rê de bimîne û biweste.

**4**-Qîretiya endamên çi karî be û berpirsiyariya wan bi hev re li pêş wê merceke giring e .

**5**-Şopandina karên wan endaman ji aliyê lêvegerekê û berpirsyariya wan li pêş wê lêvegerê .

Yanê mirov têdighê ku , tu kar tewşankî , bê sazkirin û bi gotgota ne baş bi serdikeve û nejî pêşve diçe .Herweha doza me Kurd li Sûriyê jî , karekî zor mezin jêre divê , serkeftina wê jî , hebûna mercên me li pêş anêne zimên gerekin .

Mexabin ji dêvla peydakirina wan mercan bervaçî wê xebat bi rê ve diçe wek :

1-Perçebûn û nelihevkirina tevgera Kurd li Sûriyê .

- Pirbûna Partiyên wê , ne kêmtirî sêzde Partiyan .
- Herweha pirbûna tar û çemberên wê ( Enî – Encûmana giştî ya Hevbend , Komîta bilind ya Hevbendî , Tensîq ).
- Tunebûna nêrîneke zelal li ser çarsekirina doza Kurd li Sûriyê di navbera aliyên tevgerê de .
- Zêdebûna Partiyên ku , tu rastiyê bêjî navên partiyan lê nabin û masiyan di golên herimî de digirin , bi hin aliyên derve ve girêdayî , û hinên dî ku , zêdegaviyan dikin , her diçe nexwşiya tevgerê pirtir dibe û nahêle berhevhatin çêbibe .

2- Di hundir her Partiyekê de , kar û barên wê bi cefa û qîretiya hin hevalan dimeşin .

Û yên dî jî , ji ber kar xwe didin alî û xwedî gotgot û loman e . Vêca defret çêdibe ku , kesên ne li yaqî , li pir ciyan cî bigirin . 3-Hemî karên têne kirin jî dûrî karên dezgehîn û pisporî ne . Yanê tewşankî dimeşin wek Ereb dibêjin : Harit kul mîn îda ilo .

4-Rola tevgera rewşenbîrî ya Kurd jî mirov dikare bibêje **D.R ( 11 )**

www.arsivakurdi.org

# Hêviyek Mezin

**Azad Kurdî***

Dîroka siyasî a Kurdistanê tejî xedr û îxaneta dijminên Kurdan li hember keç û xortên wî gelî ye. Ji bilî kavilkirina gund û bajarên Kurdan, zilm û zordarî, asîmîlasyon û tunekirinê, girtin, îşkence û kuştina kurdan û wd beşek ji pêvajoya serkut û çewisandina gelê Kurd bûye. Lê yek ji metodên qirêj û gemar Şehîdkirina rêberên Kurdan bûye.

Rêber û kesayetiyên mezin û bilind di nav gelan de hêsan çê nabin. Di her civakekê û di nava her gelekê de, rêber rolek sereke, girîng û bi bandor di rêvebirin û pêşdebirina xebata wî gelî de dilîzin, lewra herdem yek ji armancên dijminên kurd û Kurdistanê, ji nav birin û kuştina rêberên Kurd bûye. Dîroka xebata siyasî û mafxwaziya Kurdistanê şahidê rastîn yê vê rastiyê ye. Heta niha bi vê armancê û bi mifahwergirtin ji metodên gemar, dehan rêberên Kurd hatine teror û Şehîdkirin. Armanca dijminan eva bûye ku bi lêdan û tunekirina mejiyên Kurdan – anku rêberan – pêşiya xebat û berxwedana azadîxwazî û berevanî ji mafên neteweyî bigirin.

Tevgera rizgarîxwaziya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi sedema meşandina vê siyasetê ji aliyê dijminan ve, çendîn rêberên leheng û navdar ên xwe ji dest dane. Di sedsala 20'an de, polîtîka han bi xurtî li ser gelê Kurd hate meşandin. Ji ber ku xebat û berxwedana Kurdan germ û gurr bûbû, di vê navberê de rêberên wek Simayîl Axayê Şikak, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û dehan rêberên din li pêşiya karwana şehîdên têkoşîna azadiyê di Rojhilatê Kurdistanê de bûn gorî.

Ji ber pêşengbûna PDKÎ di têkoşîna azadiyê di wê parçeyê Kurdistanê de, piraniya rêberên navdar û mezin yên şehîdkirî ên Kurd rêberên vê partiyê bûne. 3 rêberên navdar ên Kurd, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û herwiha dehan endamên din ên rêberiya partiyê, gorî û bedelên vê partiyê bûne ku jiyana xwe kirin qurbaniyê azadiya Kurd û Kurdistanê û hertim wek rûmet û sembolên gelê Kurd û PDKÎ hatine/tên hesibandin.

26'ê Xermanana 1387 (16'ê Îlona 2008)'an, 16'hemîn salvegera teror û Şehîdkirina rêberên navdar ê Kurd, Dr. Sadiq Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ û hevalên wî: Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî û nûnerê partiyê li derveyî welat, Humayon Erdelan, berpirsiyarê partiyê li Almanya û Nûrî Dêhkurdî kesayetiyê siyasî ê Îranî û dostê gelê Kurd bû.

Di 17'ê Îlona 1992'an de, çend seet piştî beşdarîkirina şanda han a PDKÎ bi serokatiya Dr. Sadiq Şerefkendî di Kongreya Enternasyonala Sosyalîst de li Berlînê, dema bi komek kesyaetiyên siyasî ên Opozîsyona Îranê re civiyabûn, kete ber êrîşa terorîstên Komara Îslamî ku ji aliyê desthilatdarên herî payebilind ên rejîmê li Tehranê fermana wê terorê hatibû dayîn û bûne goriyên siyasetên terorîstperwerane ên vê rejîma gemar û Şehîd bûn. Armanca Dr. Şerefkendiyê nemir eva bû ku dixwast bi lidarxistina van cure civînane li Ewropayê, bi rêya gotûbêj û diyalogê yekîtî û hevbendiyeke xurt di navbera hêzên siyasî û neyarê rejîma Komara Îslamî a Îranê pêk bîne. →

www.arsivakurdi.org

PDKÎ herdem bawerî bi yekîtî, hevxebatî û hevgirtina hêzên siyasî ên dijberên rejîmê hebûye/heye, lê wê demê ji ber guhartinên navneteweyî û herêmî û heta guhertinên di asta hundirê Îranê de, ew pêwîstî zêdetir derxistibû holê. Lewra bi piratîk dest da xebat û gotûbêjê bona yekgirtîkirina hêzên Opozîsyonê da ku bi bername û platforemek hevbeş li dijî rejîma desthilatdar têkoşînê bimeşînin. Wê demê Dr. Şerefkendî pirr li ser hekîtî, hevxebatî û hevpêwendiya hêzên siyasî ên neteweyên bindest ên Îranê tekez dikir û weke hewcehiyeke giring û bi bandor dihesiband. Me dît çendîn salan piştî Şehîdbûna Dr. Şerefkendî, rêvîngên rêbaza wî şagirtên emegdar ên Dr. Seîd, bi pêkanîna Kongreya Neteweyên Îrana Federal ew xewn û xweziya wî anîne cih û niha hêzên siyasî ên hemû gelên Îranê li dora hev civiyane û di çarçoveya vê kongreyê de xebata hevbeş birêve dibin.

Heke em bixwazin lênihêrînekê li ser jiyan û serpêhatiya Dr. Şerefkendî bikin, divêt mirov her ji temenê zarokatiya wî re birame û binirxîne, ew yek hewcehî bi lêkolîn û dahûrandineke zaf heye, lê di vê nivîsarê de heke bi kurtî be jî, em dê basa rola wî rêberê zana û navdar di tevgera rizgarîxwaziya Rojhilatê Kurdistanê de bikin.

Dr. Şerefkendî di demeke pirr hestyar de bû Sekreterê Giştî yê PDKÎ. Ji ber vê çendê ku ew xwediyê gellek taybetmendiyên bilind bû, piştî şehîdbûna Dr. Qasimlo wekî kesayetiyekî herî xwedî şiyan û karîn û şagirtekî emegdar yê Dr. Qasimloyê nemir, erkê rêberîkirina PDKÎ bigire stûyê xwe û nehêle ku valahiya mezin a nemana Dr. Qasimlo, rêbaza wî lawaz bike û dilê dijmin û neyaran şa be. Kesayetiya zanistî û akademîk, ceribînên siyasî û rêveberiyê di dema tevlîbûna wî di nav refên PDKÎ û xebitîn di kêleka Dr. Qasimlo û herwiha hesta şoreşvanî û welatparêziyê, Dr. Şerefkendî kiribû yek ji rêber û hevreyên Dr. Qasimlo. Her çiqas Dr. Sadiq Şerefkendî tenê ji bo dema sê salan Sekreterê Gitî yê partiyê bû, lê di wê heyamê de gellek baş kar û barên partiyê dimeşand û serkevtina wî pirr xuya û berçav bû. Rayedarên Komara Îslamî wisa difikirîn ku bi teror û Şehîdkirina Dr. Qasimlo, tevgera azadîxwaziya Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê û nemaze xebata PDKÎ dê rastî têkçûnê bihê yan dê pirr jar û lawa bibe, lê me dît ku Dr. Şerefkendî bona ku dilê dijmin û bikujên Dr. Qasimlo şa nebe û bi xewn û miraza xwe negihîjin, bi awayekî berfireh dest da organîzekirina kar û xebatên PDKÎ di hemû warên rêxistinî, ragihandin, dîplomasî û wd... û heta astekê valahiya Şehîd Dr. Qasimlo tejî kir. Di rastî de, her ew rola erênî û çeleng û bi bandor a Dr. Şerefkendî bû sedem ku desthilatdarên terorîstperwer ên Komara Îslamî bikevine fikra daw û pîlaneke din û wî sermayê mezin yê gelê bindest ê Kurd ji me bistînin û di vê yekê de jî serketin. Me dît, piştî Şehîdbûna Dr. Qasimlo ku Dr. Şerefkendî wekî cihgirekî jêhatî ê wî bû kesê yekem yê partiyê û hêviyeke mezin di nav dilê xelkê Kurdistanê û Kadro, Pêşmerge, alîgir û dostên PDKÎ û têkoşîna azadiya Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê de pêk hatibû û pêşdebirin, ji nû ve organîzekirin û bihêzkirina PDKÎ dilê her dilsozekê ronî kirbû, ji me hate standin û di 17’ê Îlona 1992’an de car din ew cinayeta hov ji aliyê rayedarên Komara Îslamî li dijî rêberên PDKÎ hate meşandin ku, xem, kul û keserên birînên wê cinayetê terorîstî hêj sivik nebûye û heta bidestveanîn û misogerbûna hêvî û armancên Şehîdê navdar û nemir, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî û tev Şehîdên rêya azadî û demokrasiya Kurdistanê sivik nabin.

* Rojinama Agirî Hejimar /96/

www.arsivakurd.org

# Hevpeyvîn bi mamoste Zerdeşt Mustefa -Endamê Encumena giştî ya (DAD)ê- re

Hevpeyvî:Nûşîn Bêcirmanî

Mamoste **Zeredeşt Mustefa** ,bi navê weşana **NEWROZ**, em xêrhatina we dikin, dilxweşin ku di vê hevpeyvînê de, hun armancên saziya DAD ê, çalakiyên wê ji xwendevanên me re şirove bikin. Hun gelekî bi xêr hatin.

**P1**-ji kerema xwe re, xwe ji xwendevanê Newrozê re bide naskirin?

**B1**-Ez **Zeredeşt Mustefa Mustefa**, endamê encumena giştî ya (DAD)ê me ,ji 20 salan ve ez avokatiyê dikim, em ji xizmeta gelê xwe yê kurd re amade ne. Ez ne siyasetmedar im, ango ez di ti partiyên tevgera kurdî de kar nakim, lê ez ne dûrî wa me jî, rêz û hurmeta min ji hemiyan re heye, ji ber dema mirov nêzîkî doza gelê xwe be, wê wilo jî ciyê rêz û hurmetê be, min 3 zarok hene, kurek û 2 keç, ez ji daxwazkerên sînordanîna dûndê me .

**P2**-ji kerema xwe, hun dikarin hinekî ser **DAD** ê ji me re bipeyivin ?

B2-Belê, navê saziya **DAD** ê (Saziya kurdî ya Berxwedana Di ber Mafên Mirovan û Azadiyên Giştî li Sûriyê) ye. Em serbixwe ne, ne girêdayî bi tu partiyên tevgera kurdî ve ne, em rêz û hurmeta hemiya digrin, karê me venêrtina dadana mafê mirovan li Sûriyê û belavkirina çanda mafê mirova ye, li ba me, Kurdistan xêzek sor e, ango çênabe em erîşê berdin wê. Di van du salên dawî de, me raporek li ser dadana ser mafên mirovan li Sûriyê sala 2006an derxist û me pirtûkek bi navnîşanê (Jin di yasayên Sûriyê de) belav kir. Rapora me ya sala 2007 an ji belavkirinê re amade ye. Pere û diravê me, ji ba me ne, em arîkariyê ji tu kesî nastênin. Em eşkere ne, 4yan 5 ji endamên partiyêna tevgera Kurdî bi me re ne, ew ji Azadî , Yekîtiya Demoqrat, Wekhevî û hin dî ne. Da em bi ti partiyan ve neyêne girêdan, biryarek li ba me heye, çi endamê DADê nabe ew di tu saziyên din de kar bike. Herweha pêşinyareke din jî heye ku çênabe endamekî partiyên tevgerê di seroktiya DADê de be, ji ber em dibînin ku em ne li şûna partiyan e û ew nûnerê gelê kurd li Sûriyê ne. Ya din jî em daxuyanekê bi tek partiyê re dernaxin, lê belê çi daxuyana ku tevger bi tevayî derêxe, em jî bi wan re imze dikin.

**P3**- Gelo ev saziya we, bi mafê gelê kurd tenê ve girêdayî ye, yan bi tevaya miletên Sûriyê ve ye?.

**B3**- saziya me ji navê wê xuyaye ku saziyeke kurdî ye, lê çi dadan li ser mafê mirovan li Sûriyê têne kirin, bêyî em zanibin çi kes in, Fille, Misilman, Ereb, yan jî Kurd, em bi wan ve diçin û li ser wan dinivîsin, tenê endamê saziyê divê kurd be û baweriya wî bi doza kurdî di sûriyê de hebe. Wek nimûne, em yekî(BEESÎ) nakin endamê saziyê eger kurd be jîm, ji ber baweriya me bi partiya(BEES) nayê. Ji sala 1963an û ta niha, wan berê Sûriyê û miletê wê ne birine bal bi xweşiyê ve, (Yasayên awrte, Dadgehên leşkerî ..û hwd).

P4-Ji bo rawestandina dadanên ser mafên mirovan li Sûriyê, hun çi şêweyên kar û xebatê pêktînin?

→

www.arsivakurdi.org

**B4**-Dema nûçeyek bighe me ku kesek ji bal dezgehên parastinê ve hatiye girtin, em wê nûçeyê di malpera xwe de belav dikin, ji ber ku em dibînin eger girtin hebe, divê ew ji bal dadgehêve be, û li gor doznameke dadwerî be, gerek dadgehên awarte û leşkerî ji holê rabin. Dema wan pêşkêşî dadgehê dikin, em jî li dadgehê beşdar dibin.

**P5**-Miletê me yê kurd, ne tenê tê girtin, lê belê çewsandinin din jî hene, gelo ji bo
wan we çi kiriye?.

**B5-** Belê, berî dora heşt mehan em agedarbûn ku wê rîjêm Ereban ji Şeddadê werîne herêma **Dêrikê**, xakê li wan belav bikie, berî her kesî, me ev nûçe di enternetê de belav kir û dijî vê biryarê rawestan û me da xuyakirin ku gundî û cotkarên **Dêrikê** pidiviyê vê xakê ne. Ji bo ziwayiyê jî, me daxuyanek derxist, û gereke destelat çareserkirinekê ji rewşa welatiyan re bibîne û li wan xwedî derkeve.

**P6-** Danûstandinên we bi rijîmê re bi çi rengî ne?.

**B6-**Ti danûstandinên suruştî nîn in, hevalên me ji bal dezgehên Parastinê têne xwestin û ew lêkolînan bi wan re dikin, ya din, hin ji hevalên me ji bo derketina derveyî welêt berbendkirî ne, ango nahêlin ew beşdariyê di kongirên li deverna çêdibin beşdar bibin. Û eger ew li wan beşdar bûn jî, ew wan dixwazin û pirs û lêkolînan bi wan re dikin. Weke nimûne, berî demekê, Serokê saziyê ji bal parastina (EL-CEWIYYA) ve hate xwestin, nêzîka heftiyekê her roj ew dibirin, sibehî digotin êvarî were, û êvarî jê re digotin sibehî were!!. Weke min got, em eşkere ne, tozika me di enternetê de belav bûye, navê endamên encumena giştî di enternetê de hene û di her demekê de heye ku em bêne girtin .

**P7**-We beşdarî di kîjan kongirê rêxistinên mafên mirovan de kiriye?.

B7- Belê, hevalên me li (Rebatê, Istembolê, Qahireyê, Lubnan û 4caran jî li Urdunê amade bûne.

**P8**- Têkiliyê we bi tevgera kurdî re, bi çi rengî ne?.

**B8**- Dema me saziya xwe damezrand, em
çûn ba piraniya partiyên tevgera kurd,
me ji wan re da xuyakirin ku em saziyeke mafê mirovane û em cihê wan nagirin
ji ber ewin yê nûnertiya gelê me dikin û em ji wan re piştgirin, çimkî em jî parçek ji gelê kurd in.

**P9-**Hun çi daxwazê ji tevgera kurdî dikin?.

B9-Berî her tiştî, em doza avakirina lêvegereke kurdî û yekbûna peyva kurdî dikin, em dixwazin ew nêzîkî hev bibin, ji ber ku em ti sûdê ji gotinên qelew wernagirin, ne tenê wilo, ew ziyanê dighênin pirsgirêka gelê me ya dadmend, ne avakirina lêvegera kurdî, bêaramiyekê li ba me çêdike.

**P10**- Hun şaşiyê li kû derê dibînin mamoste, ez naxwazim tu bi nav bikkî?.

**B10**-Lingê min neyêxe soleke teng de(Bi ken), tiştekî tenê ez dixwazim bêjim, gerek partiyên me ji gel re kar bikin ne ji partîtiyên xwe re, çi gaveke merov bide, gereke doza gel ew ya herî li pêş be.

**P11**-Gelo têkiliyên we bi saziyên Erebî yên mafê mirovan re hene?.

**B11**-Belê hene, ev kar bi hin hevalin min ve girêdayî ye. Pêşinyarek ji bo avakirina toreke mafên mirovên kurd li ba me heye. Ya dî, me daxwaza xwe daye fidraliya dewlî, da em têde bibin endam. Ji bo saziyên Erebî, çi saziyek nerîna wê li doza gelê me ne nerînek şoven be, em têkiliyan pêre saz û avadikin: **D.R.(11)**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Te got û**

ku , pir qels e . Belkî pirî caran jî kartêkirinek neyînî jî dilîze . Ew jî di çarçawa rexin , lome û gotgotên ne pîvayî de dere û tê .
Wêlomê jî tevgera Kurd li Sûriyê jar , perçe , nelihev û dûrî cemawerê Kurd de Vêca gelî partiyên bura heval , dost , û xemxarên doza Kurd li Sûriyê , ez di bextê we da me zor bilezînin û li doz û tevgera xwe xwedî derkevin . Ji ber ku , karwan bi lez bi rê ketî û diçe , tirsa mine em li şûn bimînin .

**DumahîK: Sûriyê û....**

rijîma parta Be'is dihêlin ku jiyan û têkliyên xelkê , xwe bi xwe , aloz û tevlihev bibin , girêk û nakokî bêtir û gurtir bibin , bi taybetî encam û kartêkirina rola fermana 49 ya 30-09-2008 an , ya ku hêştiye pêvajoya jiyana aborî , kirînfirotan û pirojeyên avahiyê di herêmên Cezîr , kurdax , Kobaniyê û Tilebyedê de bi tundî bêne dorpêçkirin , rê li ber teng bibe û bête girtin . Lewre jî , li gor vê tabloya jiyana rojane ya hundirê Sûriyê bi kurd û Erebên xwe ve , û berdewamiya siyaseta tek partiyê , rojên nêzîk ne yên xêr û xweşiyê ne. Loma jî , barê rewşenbîr , zana û hişmendan , barê partiyan û siyasetvanên dilsoz her diçe nazik û girantir dibe . Hest û bawerî bi rê û şêweyên hevkarî û lihevkirinê di navbera kesan de , di navbera civakê de , bingeha hêja ya herî sereke ye .

**Sînorê yekta**

**Dumahîk : Hevpeyvîn.....**

**P12**-Derveyî siyasetê, weşana NEWROZ guhdariyê li zimanê kurdî dike, gelo hun
Wek sazî we çi kar ji bo zimanê kurdî kiriye?.


**B12**- Bi rastî, me tu karê wilo berçav ji bo zimanê kurdî nekiriye,lê hevalin me Hene, ew di girûpên zimên de kar dikin, lê bi rastî ev nifşê me yê nû guhdariyê li ziman û çanda gelê xwe dike, ez dibînim gereke partiyên me piştgîriya van girûpan bikin. Hêjayî gotinê ye, di warê zimanê kurdî de ez dibînim gerek
a-vekirina dibistanên fêrkirina zimanê kurdî, li herêmên ku kurd lê dijîn pêwist e.
b- Gereke zimanê kurdî li Sûriyê bibe zimanê fermî yê diwemîn, ji ber jimara gelê me 15%ji niştimanwerên Sûriyê ye.
c-Gerek ev girûpên ziman di bin çavdêriya partiyên tevgerê de bin û ew jî ji wan re piştgir bin .

P13-Gotina te ya dawî ji xwendevanên NEWROZê re çiye mamoste?.

B13- -silav û rêzên min ji xwendevanên NEWROZ re hene, bi rastî, ew di çanda kurdî de mûmeke balkêş e, ez daxwaza ferehkirina babetên wê dikim, rêz û hurmeta min ji NEWROZ re heye. Gotina min ya dawî ji herkesî re ye (Gereke em rêz û hurmeta mirovan bigrin, ji ber ku ew mirov in).

**Mehmûdê Helaq(Bavê Siwar)**


**Çû ber dilovaniya Xwedê**



Roja Sêşembê 14.10.2008 Z, xelkên taxa Kornîş li Qamişlo û malbata **Xelef Biro**, xatirên xwe yê dawî ji welatparêzê bi rûmet **Mehmûdê Helaq** xwestin û laşê wî di goristana gundê **Sêmitik** de bi cih kirin.

Sala 1933an, Mehmûdê çavên xwe li ronahiya gerdûnê vedike û di malbateke welathez de mezin û perwer dibe. Piştî ku ew bîrewer dibe, di tevgera kurdî de cih digre û xebata rêxistinî dike û ji bo doza gelê xwe ya dadmend ji dil û can kar û xebatê dike, ji hevalên xwe re dibe nimûneyeke balkêş. Serê malbat, dost, heval û hogirên wî sax be û xwedê wî bi buhuşta xwe şa bike

www.arsivakurdi.org




www.ersivakurdi.org

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***